Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1311 28-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Gundê Rikava

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Gundê Rikava yek ji gundên beravê ye ku di dema berê de bi av û kaniyên xwe dihat naskirin, lê niha bi sedema kêmbaranê û girtina dewleta Tirk ji ava Diclê re hemû kaniyên di gund de çikiyane.**


Şikrî Sebrî


Fatima Hec Ibrahîm

Gundê Rikava di dema berê de tenê çend mal bûn, lê di sala 1953'an de hin kesên Basiqlî ji zaxo hatin û berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê, ji ber ku li wir jî çend mal hebûn hebû bi navê Rikava êdî zevî ji Hacî Miho û Fetah Ebdulkerîm kirîn û gund avakirin. Navê gund ji rikê hatiye ku ji rik hevde ango di rex hev de ev gund ava kirin. Di gund de Basiqlî, Seyîd, Dilmemik û Hesinî hene.

Di derbarê jiyana gund û rê û resmên dema berê de welatiyên ji gundê Rikava yên bi navê Şikrî Sebrî û Fatima Hec Ibrahîm ji Rojnameya me re axivîn.

**Jiyan û çanda gund**



Welatiyên bi navê Şikrî Sebrî li ser jiyana li gundê Rikava wiha anî ziman: "Di dema berê de di gund de çem û 10 kanî hebûn, di zivistanan de wek deryayê lê dihat zêde dibû, lewma gundî hertim diçûn nêçîra masiyan. Di dema berê de herkesî berê xwe dida çandinî û sewaldariyê ji ber vê yekê piraniya xwarinan xwezayî bûn û ji zeviyên gundiyan bûn. Di wê demê de xwarina me meyir, savar, nîsk û nok bûn, me genim bi cerin û mêkutan dikir dan da ku em meyirê çêbikin. Herwiha dema em diçûn palehiyê, em kom bi hev re diçûn nêzî 12 kesan, mêran dîlok û stran digotin û palehî dikirin, jinan jî li pey wan melû dihlandin heya ku ew zevî bidawî kiriban wiha gundiyan hemûyan bi rihê civaka komînal kar dikirin. Di dema berê de gundiyan ji rêzê bi hev re dest bi seyandina malan dikir da ku haziriyên xwe ji bo meha zivistanê bikin. Lê di dema niha de her tişt ji wateya xwe dûr ketiye, çem û kaniyên di gund de çikiyane, çandinî û sewaldarî kêm bûye, ew rihê gundîtî û civakbûnê winda bûye."

**Rê û resmên dawetan di dema berê de**

Gundiya bi navê Fatima Hec Ibrahîm anî ziman ku dawetên dema berê ji 3 rojan heya heftiyekê berdewam dikir û wiha got: "Her kesekekî daweta xwe li gor imkaniyên xwe çêdikirin, di dema berê de berbû hebû ku şeva dawetê malbata zava diçûn mala bûkê û destên wê hine dikirin û li wir diman, roja din jî bûk hazir dikirin. Her kesekî li pêşiya mala xwe dawetên xwe dikirin, sebeha zû destika sbehê hebû ku daholvan û zirnevan ji sibeha seat 5 li dahol û zirnê didan hemû gundî li hev kom dibûn û dîlan digirtin li pêşiya mala zavê. Dawetên dema berê gelekî xweş bûn, dema dibû dawet hemû gundî kom dibûn û bi mala bûk û zavê re kêfxweşî dikirin. Di dema berê de kebaniyên mezin xwarina dawetê çêdikirin, her malbatek li gor rewşa xwe ya madî sewal digurandin, yên rewşa wan baş çêlek şerjêdikirin û dikirin qelî. Di dema berê de zehmetî gelek hebûn, lê wateya jiyanê hebû, lê dema niha de rehetî zêde bûye xweşiya jiyanê nemaye."

## Gotina Dawî



### Gefên Tirkiyê li ser Kurdan!

Mihemed Seydi

Hefteya derbasbûyî civîna Netewyên Yekbûyî li DYA hat lidarxistin û weke her carê mijara rewşa Sûriyê û Xezayê rojeva sereke bû. Dîsa yên herî zêde xwestin pesna xwe di çûna Amerika û hevdîtina li gel serokê wî Welatî Trump bidin, serokê Tirk Erdogan bû. Wî di vegera Turkiyê de dîsa ji Rojnamegeran re got ku ew li gel dostê xwe axivîye û encamên pir baş bi dest xistine. Lê her kes dizane ku mijarên sereke ku Erdogan ji bo wê xwe lavayî Trump dike ewe ku rê bide êrişî QSD'ê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin û ya din jî balafirên F35'e.

Li aliyê din, dewleta Tirk ya ku di hemû daxuyaniyên wê yên dawî de çekdanîna Kurdan heye, dibêje Kurd birayên wan in û ew dixwazin li gel Kurdan aştiyê pêk bînin. Ev daxuyaniyên wan jî gotina Gurê ku derket pêşberî ajalên din û got, ger hûn dengê xwe di hilbijartinan de bidin min, nema Goşt dixum.

Ev jî mesela dewleta Tirk û Kurdan e. Dîsa îro serokê MHP Dewlet Bahçelî ji Rojnameyeke Tirkî ya bi navê Turkguneyî re axivî û got ku Amerîka û hêzên Rojavayî dixwazin Îsraîla duyem li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bikin û dîsa gef li Kurdan xwar. Ev jî bûye rêbazê dewleta Tirk a qirkirina miletan ku Ermen di bin navê Gawirin qirkirin û Elewî bi jirêderketinê tewanbarkirin û komkujî bi serê wan de anîn û heta niha jî Kurdan bi cûdaxwaziyê bi nav dikin û êrişî wan dikin. Lê piştî Rêber Apo dest bi pêvajoya aştiyê kir, vê carê navê Îsraîla duyem li du Rojavayê Kurdistanê dixin.

Her çiqasî dengeyên navdewletî û berjewendiyên hêzên rojavayî rê nade ku dewleta Tirk êrişî QSD'ê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike, lê tirsa dewleta Tirk di rastiyê de ew e ku Kurd bibin hêzeke naskirî û xwedî bandoreke zêde di qada Cîhanî de. Lewma dibêje an hûnê çekan deyînin û teslîm bibim an jî ez ê êriş bikim. Her kesî dît li Efrîn û Serêkaniyê çi komkujî pêk anîn. Ma li Efrînê Îsraîl hebû ku malên xelkê talan kirin û xwezaya wê dan ber Panzêr û Kepçeyan? An li Serêkaniyê Filestînî hebûn, ku xwe wekî berevanê wan bi nav dikin, da wan rizgar bikin êriş kirin?

Li ser rola Turkiyê, ji berpirsên Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd ji dezgeha Erebiye nêt axivî û eşkere kir ku dewleta Tirk destwerdanê di kar û barên Sûriyê de dike û bi vê dixwaze pirsgirêkên xwe yê hundirîn binuxumîne. Herwiha Çiya Kurd dîsa diyar kir ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê tu carî nebûye gef ji bo dewletên cîran.

Dixwazim bibêjim ku ger dewleta Tirk dixwaze peywendiyên aştiyê û cîrantiyê bi Kurdan re li Rojava deyîne, ne di cih de ye ku carne wan bi Îsraîla duyem û carne jî bi peywendiyên wan ên bi Amerîka tewanbar bike. Ma ne Erdogan jî li Amerîka bû û digot ew û Trump dostên hevin. Wê demê çima peywendiyên Kurdan bi aliyan re bi dijminatî dibînin?

### Sudoku:Pirs 59

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 3 | | | 4 | | 2 | 5 |
| | 6 | 4 | | 2 | | | | 1 |
| | | | | 6 | 9 | | | |
| | | 6 | | | | 5 | 7 | 2 |
| 3 | | | | | | | | 9 |
| 2 | 1 | 9 | | | | 3 | | |
| | | | 9 | 4 | | | | |
| 9 | | | | 5 | | 8 | 1 | |
| 5 | 7 | | 1 | | | 9 | | |

### Sudoku: Bersiv 58

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 3 | 6 | 1 | 7 | 2 | 8 | 4 | 5 |
| 4 | 2 | 1 | 5 | 9 | 8 | 3 | 7 | 6 |
| 5 | 7 | 8 | 4 | 6 | 3 | 2 | 9 | 1 |
| 8 | 4 | 9 | 6 | 5 | 7 | 1 | 2 | 3 |
| 2 | 5 | 7 | 8 | 3 | 1 | 4 | 6 | 9 |
| 1 | 6 | 3 | 2 | 4 | 9 | 5 | 8 | 7 |
| 3 | 8 | 4 | 7 | 1 | 6 | 9 | 5 | 2 |
| 7 | 9 | 5 | 3 | 2 | 4 | 6 | 1 | 8 |
| 6 | 1 | 2 | 9 | 8 | 5 | 7 | 3 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Xwe reşbelek girê da:**
- Jinên ne pir ciwan dema xwe dixemilînin ji wan re tê gotin.
**Ya li ber neynikê ye:**
- Jinên her tim bi bejin û bala xwe ve mijûl ji bo wan tê gotin.
**LI SER DIYARKIRINA SERBESTBÛNA KESEKÎ**
**Caw û meqes di destê te de ne:**
- Tu çawa bixwazî wisa bike; esil tu yî.
**Cang û meqes di destê te de ne:**
- Bi heman wateyê.
**Gaz/gez û meqes di destê te de ne:**
- Esil tu yî; ka tu çawa dizanî bila wisa be; biryar ya te ye.
)Berê li şûna metrê gaz bi kar dianiyan)
**LI SER XWEŞBÛN, BAŞBÛN Û BEDEWBÛNÊ**
**Bû cercere**:
- Pir xweş bû; pir baş çêbû.
(Cercere ji dep û daran tê çêkirin. Di binê wê de bi dehan bivir tên asêkirin. Ji aliyê du gayan ve tê kişandin. Di bênderan de qirş pê tê hûrkirin(
**Bû mehîra bipûng:**
- Pir xweş e; çawa ez dixwazim wisa ye.
**Civat germ bû:**
- Mirovên di civatê de bêdeng bûn; baş guhên xwe danê.
**Gotin jê re navê:**
- Pir baş e, pir bedew e.
**Hê tama wê di devê min de ye:**
- Pir xweş bû; nayê jibîrkirin.
**Hê tama wê li ber devê min e:**
- Bi heman wateyê.
**Hê tama wê di bin zimanê min de ye:**
- Bi heman wateyê.
**Mirov li cem pîr nabe:**
- Hevaltiya wî xweş e; mirovekî henekoyî ye; civata wî xweş e; axaftinên wî xweş in; sebra mirov li cem tê.
**Şer xweş e li şovê ne li beyarê:**
- Awayê tu dibêjî ne xweş e; cihê tu dibêjî ne baş e; pêwîst nake em biçin cihekî din.
**LI SER BAŞKIRIN Û XWEŞKIRINÊ**
**Bihar anî kabê:**
- Ji me re pir xweş kir.
**Bi hev re nangenimiyan dikin:**
- Ji hev re xweş dikin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

---

## Anahîd Qesabiyan: Konferansa jinan bingeha avakirina projeyeke demokratîk e

Berdevka Yekîtiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan diyar kir ku lidarxistina konferansa jinan di vê rewşa hestyar a ku herêmê tê re derbas dibe xwedî girîngiyeke mezin bû û got, "Konferansa jinan bingeha avakirina projeyeke demokratîk e." R-2



## 'Heta ku Rêber Apo azad nebe wê tu pirsgirêk çareser nebe'

Endama Rêveberiya Aboriya Kongra Star a Qamişlo Xaliya Necar diyar kir ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ji bo serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi erkên xwe yên dîrokî rabûn, lê dewleta Tirk heta niha helwesta xwe diyar nekiriye. R-4



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1311 28-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Piştgiriya malbatê ewlehî û aramiyê dide zarokan'



Endama Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan Perwîn Loqo anî ziman ku piştgirî û destekdayîna malbatê ji zarok re, ewlehî û aramiyê ava dike. Perwîn Loqo da xuyakirin ku malbat kesayeta zarok ava dike û parastina nirxê zarokan erka wê ye. R-6

# GELÊN SÛRIYÊ ÇI DIXWAZIN? SÛCDAR EŞKERE YE Û DIVÊ HESAB BÊ PIRSÎN!

Maseya di navbera Colanî û Amerîkayê de ne maseyeke aştiyê ye, ew maseyeke ji bo bersivdayîna awarte ye li hember xerabiyên ku Tirkiyê afirandiye û ji bîr mekin: Gelên Sûriyê dê siberoja xwe bi xwe binivîsin, ne bi destûra Washingtonê û ne jî bi zexta Enqerê. R-5



## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermend Hacî Mûsa yek ji girîngtirîn dengên resen derkete pêş, wî barê parastina nasnameya neteweyî û berevaniya nirxên Kurdî da ser milê xwe... R-7



Rêya me rêxistin û berxwedan e!
Sînan Cûdî R-4



Sûriyê di navbera peymana Adarê û bêhêziya Şamê de ber bi ku ve diçe?
Idrîs Henan R-5



Desthilatên munafiq
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

## Ikram Balekanî: Li Ewropa qirkirina spî heye

Ikram Balekanî bi gotinên Kurdî yên pêşiyan ku kevir li cihê xwe giran e û dar li ser koka xwe şîn dibe tekez kir ku mirov jî li ser axa xwe û bi çanda xwe zindî ne û got, "Bi saya Tevgera Azadiyê, Kurdên li derveyî welat xwe bi rêxistin kirine, sazî û dezgehên wan hene, eger Kurdek xwe dûrî van saziyan û vê civakê bixe, wê di nava çerxa serdest de bihele." R-3



# Anahîd Qesabiyan: Konferansa jinan bingeha avakirina projeyeke demokratîk e

**Berdevka Yekîtiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan diyar kir ku lidarxistina konferansa jinan di vê rewşa hestyar a ku herêmê tê re derbas dibe xwedî girîngiyeke mezin bû û got, "Konferansa jinan bingeha avakirina projeyeke demokratîk e."**

Dîlan Mulhim\Qamişlo

Di 20 Îlonê de konferansa jinan bi dûrişmeya "Hevgirtina Jinan Bingeha Avakirina Edalet û Demokrasiyê ye li Sûriyeya nenavendî û yekgirtî" ji aliyê Kongra Star û Kombûna Jinan a Zenûbiya ve li bajarê Hesekê hate lidarxistin. Herwiha di Konferansa "Hevgirtina jinan bingeha avakirina edalet û demokrasiyê ye li Sûriyeya nenavendî û yekgirtî" de hate gotin ezmûna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê îspat kir ku jin modeleke hevgirtî ya rêveberiyê ava dikin, mafên xwe û civaka xwe diparêzin û beşdarî nivîsandina destûra siberojê bibin. Di heman demê de, ev konferans ne tenê hevdîtinek bû ,bi qasî ku platformek stratejîk e ji bo yekkirina nêrîna jinan ji bo Sûriyeke demokratîk, piralî û nenavendî ku mafên jinan û hemû pêkhateyên civakê biparêze û li ser îradeya azad a gelê xwe ava bibe, hate lidarxistin. Di vê çarçoveyê de berdevka Yekitiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan ji Rojnameya me re axivî.



**'Lidarxistina konferansa jinan xwedî girîngiyeke mezin'**

Anahîd Qesabiyan da zanîn ku konferansa jinan a bi dirûşmeya "Hevgirtina jinan Bingeha Avakirina Edalet û Demokrasiyê ye li Sûriyeya nenavendî û yekgirtî" ne tenê hevdîtinek bû, lê belê platformeke stratejîk bû û wiha got: "Di konferansa jinan a li bajarê Hesekê de gelek siyasetmedar, hiqûqnas, rewşenbîr, endamên eşîrên Ereban ên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Heleb, perav û Şamê, derdora 700 delege beşdarî konferansê bûn. Herwiha di konferans de hate eşkere kirin ku pêwîst e jin di pêşeroja Sûriyê de xwedî biryar bin. Ev konferans bingeha avakirina projeyek demokratîk e. Konferansa jin di rewşeke hesas a ku herêm te re derbas dibe, hate lidarxistin. Ji ber vê lidarxistina konferansa jinana xwedî girîngiyeke mezin e."

**'Pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê mafê jinan di destûra Sûriyê de bipejrîn e'**

Anahîd axaftina xwe wiha berdewam kir: "Ev demeke hem ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve û hem jî ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê ve gef li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên xwarin. Lê lidarxistina konferansa jinan li hemberî vê yekê peyamek bû. Di heman demê de, li Sûriyê jin rastî revandin, kuştin, işkence, tundî û hwd.. tên. Ji ber vê yekê pêwîst e jinên Sûriyê li hemberî vê siyaseta qirêj têkoşîna xwe xurt bike. Herwiha jinên ku tevlî konferansê bûn gotin ku pêwîst e Sûriyeke demokratîk, nenavendî û wekhev were avakirin. Lewma jinan diyarkirin ku pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê mafê jinan di destûra Sûriyê de bipejrîn e."

**'Azadî, wekhevî û nenavedî tenê riya avakirina Sûriyeke nû ye'**



Anahîd Qesabiyan anî ziman ku di konferansa jinan de li ser avakirine destûreke ku mafê hemû pêkhateyan di nava xwe de dihewîne hate nîqaşkirin û wiha pê de çû: "Helwestên jinan di konferansê de sozek hevbeş bûn û diyarkirin ku pêşeroja Sûriyeyê dê li ser dûrxistin an jî dûrxistina nîvê civakê neyê avakirin, lê belê dê li ser naskirina jinan wekî hêzek biryardanê were avakirin. Herwiha piştrast kir ku hemû hewldanên revandinê û binpêkirinên giran ên li dijî jinan bi tu awayî hêza wan naşkîne. Di heman demê de, jinan tekezkirin ku azadî, wekehevî û nenavedî tenê riya avakirina Sûriyeke nû ye."

Berdevka Yekitiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Jinên Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe dikarin beşdarî avakirina siberojeke hevbeş a demokratîk û adilane bibin. Di heman demê de, ji bo avakirina Sûriyeyeke demokratîk, pirrengî, nenavendî ku rûmeta jinan biparêze û mafên hemû gelan mîsoger bike, dê bi xwişkên xwe yên ji pêkhateyên din ên Sûriyeyê re bixebitin."

# Cîhan Ebdulxefûr: Huner sembola afrîneriyê ye mîratê diparêze û nasnameya xwe zindî dihêle

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Cîhan Ebdulxefûr ji salên zarokatiya xwe yê dibistanê ve, ku bi gelek şêweyên hunerî re mijûl bûye, beşdarî pêşangeh û festîvalan bûye, bingehên hunerên kevneşopî fêrî zarok û ciwanan dike, bi baweriya ku huner amûrek e ji bo parastina bîra kolektîf.**

Hunera bedew (şêwekarî) wekî navgînek ku dîrok û şaristaniya welatekî yan neteweke nîşan dide û jîngeha herêmî û taybetmendiya çandî û civakî radixe ber çavan. Hunermend bi hunerên şêwekariyê cihêbûna çanda netewî ji çandên din dide diyarkirin. Yek ji van Şêwekaran Cîhan Ebdulxefûr e ku ji 9 saliya xwe vê heta niha bi temenê 38"an dev ji vî karî bernedaye.

Evîna Cîhan ji hunerê di rojên dibistanê de dest pê kir, Ji neh saliya xwe ve, wê gavên xwe yên pêşîn ber bi cîhana hunerên destan ve avêt û hewesa xwe di hûrguliyên nazik û rengên zindî de dît. Karê wê



yê yekem çêkirina gulek ji hevîrê seramîk bû û wê naskir ku huner ne tenê hobiyek demkî ye, lê di heman demê de pîşeyek e ku dê di tevahiya jiyana wê de bi wê re be, karê bi kevîrê seramîk ji bo wê ne tenê derseke birêkûpêk bû, lê belê destpêka rêwîtiyek bû. Ew li ser vê yekê dibêje: "Ez beşdarî pêşbirkên pêşengan dibûm û di rêza yekem de bi ser diketim, heta ku min di zarokatiya xwe de madalya wergirt û ji wê demê ve min qet dev ji karê xwe yê şêwekariyê bernedaye."

Wê xwendina xwe di warê hunerê de domand, piştre dest bi karê mamostetiyê kir û li dibistanan bû mamosteya hunerê. Lê evîna wê ji bo hunerên destan pir mezin ma ku di dersxaneyê de bimîne û piştî ku dev ji perwerdehiya fermî berda, wê biryar da ku balê bikşîne ser fêrkirina hunerên destan ji zarokan re û tenê sê meh şûnda, wê pêşangehek mezin vekir.

**"Zuleyxa" Tabloya yekem**

Tabloya wê ya yekem bi navê "Zuleyxa" bû, ku wê dema ciwan bû bi destên xwe çêkir û li sûkê nîşan da. Gelek kes pesnê tabloyê dan, ew kêlî pir girîng bû, ji ber ku bawerî da wê ku huner dikare bibe rêya wê. Destpêkê bavê wê, ku di destpêkê de li ser hesabê xwendina wê, teşwîq nedikir ku ew bi hunerê re mijûl bibe. Piştî ku di civîna dê û bavan de mamosteyan pesnê wê dan li pêşiya wî, fikra xwe bi tevahî guherand. Cîhan li ser bavê xwe dibêje: "Ji wê demê ve, bavê min piştgiriya min a herî mezin bû û ew di beşdarbûn û pêşbirkên min de gav bi gav bi min re bû."

Hin berhemên wê yên herî berbiçav ev hene: "Şah Maran," "Tawûsê Melek," "Medûsa," û her wiha tabloya xwe ya yekem "Zuleyxa" li festîvalekê ji nû ve pêşkêş kir.



**Hezkirin veguherî îlhamê**

Ew dibêje, daxwaza ji bo karên wê yên destan pir zêde dibe, nemaze bi nêzîkbûna Newrozê. Çi bi rêya pêşangehan be, çi jî bi rêya daxwazên li ser telefon, Karê wê yê îro jî ji dirûtinê, nekiş, hirî, morîk û karên bi depan pêk tê.

Cîhan şîretê dide jinên ciwan ên ku dixwazin bikevin cîhana hunerên destan ku berdewam bikin û dev jê bernedin: "Her kar hewceyê hewes û ajotina hundirîn e. Têkçûna di destpêkê de normal e, lê serkeftin hêdî hêdî tê. Ya herî girîng ew e ku mirov bi şikestina yekem nesekine."

Her çiqas wê ji zarokatiya xwe ve di warên cûrbecûr de wekî boyaxkirina krîstal û çêkirina xalîçe û kulîlkan ji seramîkê de dersan dida zarok û mamosteyan, lêbelê niha wextê wê têrê nake ku korsên fermî veke, lê ew kesên ku dixwazin di atolyeya wê de fêr bibin pêşwazî dike an jî materyal û ravekirina rêbaza kar ji wan re peyda dike da ku ew bikaribin li malê kar bikin.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

Can Yûsif



Hunermend Hacî Mûsa Dengê Çemê Dîcle û parêzvanê kelepora kurdî. Hunermendên kurd yên hemdem û welatparêz, ew parastvanên rasteqîn in ji bo nasnameya neteweyî ya kurdî û bîra wan ya zindî ne, bi deng , awaz û stranên xwe, mîrasa çandî, nasnameya neteweyî parastin û zimanê kurdî veguhastin bo nifşên pêşerojê, wan hunera xwe kir pirek ku tê de hest û hîsên neteweyî di her parçeyê Kurdistanê de yek dike, wan isbat kir ku huner ne tenê vegotinek bedewî ye, lê kiryarekê berxwedan û hêmaneke ku paşerojê bi dema niha û pêşerojê ve girêdide.

Di vê çarçoveyê de, hunermend Hacî Mûsa yek ji girîngtirîn dengên resen derkete pêş, wî da ser milê xwe barê parastina nasnameya neteweyî û berevaniya nirxên kurdî bi rêya stran û muzîka xwe ku hêza wan ji xakê, bîra gelêrî û dîroka kevnar a gelê xwe werdigirt. Hunermend Hacî Mûsa kurê Çemê Dîcle ye ku bi hîs û hêz rêya xwe di nav çiya û deştan de vedike da ku axa Kurdistanê av bide, ew ji pîrdanka gundê Zihêrîyê ya ku tije jiyan derketiye, ew yek ji gundên sînorî yên devera Dêrikê ye ku dikeve sêkoşeya sê parçeyên Kurdistanê (Bakur, Başûr û Rojava). Ev herêma ku bibû navendeke kelepûr û çanda kurdî ku li wir folklora Botanî ya kevnar, kultûra Koçerî ya resen û kevneşopiya Behdînî ya bêhempa tê tevlihev kirin, ya ku xemlandî bû bi nirxên neteweyî û mirovahiyê û di serdemên dirêj de bibû dîdargeha hunermend û helbestvanên kurd.

Hacî Mûsa di sala 1979'an de li gundê Zihêrîyê yê ku dikeve li kenarê Çemê Dîcle, ji dayîk û bavek kurd ( Elî û Ewniyê) û di nav malbatek kurd a welatparêz û kedkar de hate dinyayê, ji binemalek ku evîndarê xak û azadî û girêdayî bû bi nasname, ax û nirxên resen yên kurdayetî ve, ew yek ji neh zarokan bû (pênc kur û çar keç), ku hemî jî li ser nirxên Kurdayetiya resen û sadebûna jiyanê hatibûn firşikkirin.

Wî zarokiya xwe derbas kir li ser qumên kenarên Çemê Dîcle, li ber pêmayên aşê avê yê kevnar, di nava zeviyên Pembo û bênderên genim ên zêrîn de û di bin sîberên darên Tû û Sipîndaran û li nav kavilên Qesra Reş û şûnwarên mezargeha Keçka Kezî û Bavê Kal de, li wir, çavên wî bi hûrguliyên axê ketin, ku bûne çavkaniya îlhama wî ya hunerî.

Wî melodyên xwe ji bênxweşiya mîrasa kurdî û nebeza xakê û dîrokê û ji stranên şivan û jinan li zeviyan wergirt, herwiha wî ji ava kaniyên zelal yên xwezayê zanistên huner û stranbêjiyê vexwart, ji xumxuma pêlên ava Dîcle û fîrfîra çemê Şemlo yekemîn awazên xwe wergirt, yên ku xwe berdidan giyanê wî de, ji çîvçîva Tilorên li ser darên Bitik, Gez û Gorfên devera Navrok û Meştilê fêrî maqamên muzîka kevneşop a kurdî bû û ji vîzevîza bayên Çiyayê Cûdî û Bêxêrî ruhê strana folklorî ya kurdî wergirt, li wir nîşanên kesayetiya wî ya stranbêjiyê dest pê kir, ji têkildana xwezayê, bîra gelêrî û folklora kevnar bi hevre.

Meylên wî yên hunerî di temeneke piçûk de dest pê kir, dema ku hîn deh sal derbas ne kir bû, ew ji zarokiya xwe ve bandor bû bi jîngeha dewlemend ya mûzîkî ku di himbêza wê de mezin bû ku li nêzî herêmên Botan û Behdînan bû, ew herêma ku folklor di hemû hûrguliyên wê de zindî bû, ew balê dikşîne ser stranên folklorîk û neteweyî yên ku ji hêla hunermendên mezin ên wan deveran ve dihatin pêşkêşkirin, wek (Hesen Cizrawî, Eyaz Yûsif, Ebdulwahed Zaxoyî, Ebdulazîzê Semê, Mela Xelîl û Îbrahîm Bane Qeserî), ev hunermendan ji bo wî mîna ronahiyên ilhamê bûn, ji wan ruhê stranên folklorî û neteweyî wergirt, bi riya dengên wan di dilê wî de nirxên nasname û xwecîtiyê hatin çandin da ku di hundirê wî de tovê yekem a hunera resen şîn bide.

Hacî Mûsa dest bi stranbêjiyê kir li pêşberî malbat û hevalên xwe, di ahengên piçûk de, dengê wî yê germ û xweş ji aliyê hemû kesan ve hate hezkirin û pejirandin, evê yekê bawerî da wî ku di şevbuhêrkên gundan de xuya bibe, li wir dest bi pêşkêşkirina stranên folklorîk kir bi ruhekî rast û girêdayî xakê ve, ew şevbuhêrk bûn yekemîn mimbarên rastîn ên wî, ku di rêya wan nîşanên kesayeta wî ya hunerî hêdî hêdî dest pê kirin. Bi zêdebûna tecrube û belavbûna navê wî, ew ji nav çarçoveya piçûk derket û ber bi qadek fireh ve çû, êdî ew hate vexwendin ji bo vejîna dawet û ahengan di gundên derdorê xwe, êdî dengê wî diherikî dilan, berî ku guh bigihîje û stranên wî veguherin tabloyên zindî di bîra gelê kurd de, piştî ku hişmendiya xwe ya hunerî û hinêra xwe pêşxist, kariyera wî ya hunerî di sala 2002'an bi awayekî berfireh bi koma Mîran re destpêkir, ku bi wê re beşdarî vejîna konser û dewatên gelêrî li herêma Dêrikê bû.

Hunermend Hacî di sala 2006'an de zewicîye, ew bavê çar zaroka ye (sê kur û yek keç), ew zarok bûn nebeza dilê wî, çavkaniya germî û ilhama wî, wî di nav wan de xêzên dilovaniyê vehûnandin û hevsengî dikir di navbera vedenga stranê û dilsoziya bavtiyê de, di navbera cîhana hunerî û germiya jiyanê de .

Dema ku Şoreşa Rojava di sala 2011'an de destpêkir, Hacî biryar da ku hunerê li aliyekî bihêle û di rêzên pêşîn de cih bigire ji bo parastina ax û gel xwe, wî dev ji stranbêjî, dawet û şevbuhêrkên gundan berda û banga welat pêkanî. Di rewşên herî zehmet û dijwar de, ruhê xwe danî li ser kefa destê xwe û gihişte Hêzên Parastina Sînor. Bi bawerî bû ku erka neteweyî li ser her tiştî re ye, wî qilêş hilgirt da ku ax û şerefa xwe ji hêzên çekdar biparêze û bi vî rengî wî wêneyên rastîn ên xweparêziyê û pabendiya bi nirxên kurdayetî ve destnîşan kir û bawer dikir ku hunera rastîn pêşî ji dilsoziya bi xakê re dest pê dike. Di dawiya sala 2013'an de, Hacî Mûsa tevlî koma Cûdî bû da huner û dengê xwe bike xizmeta gel û doza wî de, û li pêşberî hemû hewldanên çewisandin û ji bîrkirinê rawestiya ,wî dixwest ku dengê xwe bike minberek ku hêviyê di dilan de vejîne û gelê xwe şiyar bike ji bo ku li dora Şoreşa xwe kom bibe û bibe bangekî piştevanî ya rastîn ku piştgiriya şervanan li eniyên şerên germ bike.

Ew bi koma Cûdî re beşdarî bi dehan şevbuhêrkên stranbêjiyê, şahiyên neteweyî û helkeftên niştimanî bû, hebûna wî di festivalên hunerî û Cejnên Newrozan de balkêş bû, şêwazê wî bû peyamekî rûmet û hêvî, ku gel kom dike li dor nirxên neteweyî û baweriya serkeftinê di dilê wan de diçîne, herwiha ew bi koma Cûdî re beşdarî tomarkirina bi dehan stranên şoreşgerî û neteweyî û çêkirina Vîdyo klîbên muzîkî, da ku bibe dengê piştgiriya Şoreşa Rojava û piştevanê Yekîneyên Parastina Gel û Jin di eniyên şerê de. Berhemên wî bi rengekî berfireh di nav girseya gel de belav bûn, ji ber ku di nav xwe de peyamên hêvî û berxwedanê hildigirtin.

Ji nav wan stranên herî navdar



Hacî Mûsa

ku şopek kûr di dil û hestên gelê de hiştine:

1-Şervano
2- Jîna Emînî
3-Zeriyê
4-Tola Sala
5- Tîna Çiya
6-Nifişta Gerîla
7- Kurdistan

Ev stran bûn wekî nebeza şoreşê û dengê wê ya kûr, ku qonaxên wê belgekirin û nirxên neteweyî di dilên gel de bi cih kirin, da ku tekez bike ku huner dikare dengê berxwedanî bi hêz û bandor bike.

Di dema rêwîtiya xwe ya hunerî de, hunermend Hacî Mûsa gurzek ji stranên şoreşgerî û neteweyî pêşkêş kir, çi bi koma Cûdî re an jê di berhemên xwe yên kesane de, wî ji bo şoreşê, welat û azadî, ji bo şervan û şoreşgeran, ji bo evîn û hesretê, ji bo ax û berxwedanê distrand, Stranên wî veguhêrîn tabloyên hunerî yên zindî di bîra gelê kurd re.

Ji nav berhemên wî yên herî navdarên ku bi berfirehî deng dane:

1- Şervano
2- Heftanîn
3- Kezî Zerê

Hacî Mûsa ji destpêkê ve têgihişt ku hunera kurdî ne tenê pîşeyek derbasdare, lê ew berpirsiyariyeke dîrokî û peyamek hebûnî ye, her awazeke ku ew dibêje, hewildaneke ji bo parastina zimanek, bîr û mîrasek ku di xeteriya jibîrkirinêdeye.

Ji ber vê yekê ew ji strana gelêrî û reseniya wê re dilsoz ma û bi tevlîhevkirina di navbera kelepûra stranbêjiya kilasîk, resen û ruhê hemdem de hevsengî afirand û ji nû ve pêşkêş kir bi şêwazekê nû, bê ku wê ji wateya wê ya kevin dûr bixe.

Bi riya stran û muzîka xwe wî mîrateya kurdî û nasnameya neteweyî parast, stranên wî ne tenê awazên derbasdarbûn, lê belê nameyên xweparêzî û hêvîyê bûn, pirek ku di navbera paşerojê, niha û pêşerojê de têne ava kirin û di dilên nifşên nû de hezkirina axê, ziman û nasnameyê diçînin.

Ew bi stranên xwe yê ku ruhê xakê, êş û hêviyên gelê digirin navdar bû û di nav wan de strana balkêş "Şervano" ye ku bû nîşaneke taybetî di rêwîtiya wî ya hunerî de, ew ne tenê stranekî evînî an jî folklorîk bû, lê destaneke wijdanî bû ku têde wateyên wefadarî, hezkirin û rûmet kom bibûn.

Wî peyvên xwe ji jîngeha kurdî ya tije bi çîrokên gelêrî wergirtin, strana "Şervano" nebeza çiyayan, xumxuma çeman û rondikên evîndaran, û stranên daîkan di xwe de hilgirtin, ew bû sembola hunerî ku di dawetan û helkeftên neteweyî de tê gotin û ew bûye mîna sirûdek wijdanî ku ruh û hestên kurdî li hemû parçeyên Kurdistanê yek dike, ji ber ku "Şervano" sînorên dem û deveran derbas dike, ew bûye yek ji sembolên nasname û rûmeta kurdî, ew dê herdem kulayî di bîra nifşan de bimîne, wek şahidê hêza hunerê ku dikare yekgirtina dilan çêke herçend ku sînor hebin.

Wî peyvên xwe ji jîngeha kurdî ya tije bi çîrokên gelêrî wergirt, strana "Şervano" nebeza çiyayan, xumxuma çeman û rondikên evînvanan û stranên daîkan di xwe de hildigre, ew bû sembola hunerî ku di dawetan û helkeftên neteweyî de tê strandin û ew bûye mîna sirûdek wijdanî ku ruh û hestên kurdî li hemû parçeyên Kurdistanê yek dike, ji ber ku "Şervano" sînorên dem û deveran derbas dike, ew bûye yek ji sembolên nasname û rûmeta kurdî, ew dê herdem kulayî di bîra nifşan de bimîne, bi vê mîrateya stranbêjiyê ku wî pêşkêş kir, ew beşdarî festîval û konsertên di hundir û derveyî Rojava bû, bi xwe re hunera kurdî ya resen bi herî bedewiyên wê ve diyar kir.

Bi saya dilsoziya xwe ji hunerê re û girêdana xwe bi nasnameyê ve, wî cîhê xwe wek yek ji girîngtirîn dengên hemdem yê kurdî sazkir. Hecî Mûsa hîn jî di xurtbûna dayîn û afirîneriya xwe de ye û û dê her tim di dilan de bimîne, dengek ku qet wenda nabe û mirovek parêzvanê nasnameya kurdî û mîrata çandî û semboleke hunermendekî ku huner bi rastî jiya ye û li paş xwe mîrateyek hişyarî û hezkirinê ji bo ax û mirovan hiştiye. Daxwazên min ji bo wî di rêwîtiya wî ya hunerî de serkeftin, afirandin û geşedanek zêdetir û dengê wî bimîne wekî minberekî hêviyê û parastvana nasnameya kurdî.

# ‘Piştgiriya malbatê ewlehî û aramiyê dide zarokan’

Endama Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan Perwîn Loqo anî ziman ku piştgirî û destekdayîna malbatê ji zarok re, ewlehî û aramiyê ava dike. Perwîn Loqo da xuyakirin ku malbat kesayeta zarok ava dike û parastina nirxê zarokan erka wê ye.

**Navenda Nûçeyan**

Têkiliya di navbera malbat û zarokan de wekî têgehekî pir alî û kûr, bi gelek awayan bandorê li ser dinamîkên hestyarî, civakî û tewra psîkolojîk ên zarokan dike. Mala ku zarok tê de mezin dibin, ne tenê çar dîwar û banek e, lê di heman demê de qadekî zindî ye ku tê de têkiliyên wan ên bi hev re, bi dêûbavan re û bi jîngehê re teşe digirin. Ev têkilî ne statîk e; ew bi demê re, li gorî şert û mercên malê û awayê ku ev şert bandorê li jiyana rojane dikin, diguhere û pêş dikeve. Ji ber vê yekê, dema ku em li vê mijarê dinêrin, divê em hem aliyên pratîkî yên şertên fizîkî û hem jî aliyên psîkolojîk ên wekî hest û têkiliyên mirovî li ber çavan bigrin. Derbar têkiliya malbat bi zarokê re, endama Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan Perwîn Loqo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Malbat kesayeta zarokê ava dike’**

Perwîn Loqo anî ziman ku ew her demekê ji malbat û zarokên wan bi kampaniyên hişyariyê radibin û wiha got: “Ji bo têkiliya malbat û zarokê bi hev re, em bi kampaniyên hişyariyê radibin û wan perwerde dikin, ji bo ku têkiliyek baş di navbera wan de hebe, daxwaza me ew e ku em van zarokan ji xetereyan û xerabiyên li derdorê biparêzin û wan li ser hişmendiyek rast û baqij mezin bikin. Malbat ew e a ku kesayeta zarokê ava dike, ji bo wê jî beriya ku em zarokê perwerde bikin, em malbata wan perwerde dikin ku çawa têkilî û danûstendina rast bi zarokê re bikin û çawa kesayetê zarokê xurt bikin, herwiha çawa azadiya vê zarokê bidênê ew jî di bin çavdêrîkirina wan de be û çawa zarokên xwe biparêzin ji van xerabiyên li derdorê. Rêbazên ne rasterast ên nûjen ên mezinkirina zarokan ji bo dê û bavan dijwariyek mezin in, ji ber ku divê ew fêr bibin ka çawa guh bidin zarok û cih bidin wî ku hewcedariyên xwe îfade bike. Fêr bibin ku rihet bibin da ku bigihêjin diyalogê û ji muameleya neyînî ya li hember zarok dûr bisekinin, her wiha bala xwe bidin gotinên ku jê re têne gotin.”

**‘Pêwîste bi mazinbûna zarokê re xwebawerî were çandin’**

Perwîn Loqo destnîşan kir ku zarok ji dê û bavên xwe teknîkên baş ên dê û bavtiyê werdigirin, ku têkiliyek saxlem di navbera her du aliyan de diafirîne ku wan di pêşerojê de nexe xetereyê û wiha got: “Tevgerên şaş



û neyînî yên dê û bavan dikarin di pêşerojê de bandorê li zarokên wan bikin, kesayeta wan qelis bikin û wan bêhtir ji depresyon, fikar û êrîşkariyê re hesas bikin. Girîng e ku ji destpêka mezinbûna zarokan ve xwebawerîm were çandin. Divê hinek azadî ji wan re were dayîn da ku ew bi xwe biryar bidin bêyî ku hewl bidin wan bi zorê bidin biryarekê, di heman demê de pêşkêşkirina hezkirin û lênêrînê ji bo zarokan, wan bêtir bi dê û bavên xwe ve girê dide û wan û nirxên ku ew fêrî wan dikin bêhtir qebûl dike. Ev bi dabînkirina lênêrîna laşî û hestyarî ji wan re, dabînkirina hawîrdorek malbatî ya ewle, rêzgirtina wan û nedestdirêjiya wan, diyalogkirina bi wan re, nîşandana hezkirinê ji wan re û teqdîrkirina hewildan û destkeftiyên wan ên hêsan ve tê bidestxistin. Û Ji bo ku hûn zarokê xwe baştir birêve bibin, divê hûn dem ji bo tenê mayîna bi wî re veqetînin, bi azadî guh bidin wî, wî teşwîq bikin ku hestên xwe îfade bike, hawîrdorek ewle û teşwîqker peyda bikin, sînoran bi zelalî bicîh bînin û ji cezakirina laşî dûr bikevin.”

**‘Her têkiliyeke we bi zarokê/a we re şêweyekî danûstendinê ye’**

Endama Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan Perwîn Loqo axaftina xwe wiha qedand : “Dema ku hûn bi zarokan re mijûl dibin, girîng e ku hûn wan ji rêgez û sînorên ku divê ew bişopînin û neşikînin, agahdar bikin. Heger ew van rêzikan binpê bikin cezayê guncaw bidin. Lêbelê, girîng e ku ceza ji her tundûtûjiyê an jî bêparkirina zarok ji tiştên ku dibe ku ew hewce bike, wek xwarin, dûr bixe. Armanc tenê ew e ku ew fêrî pabendbûna bi rêgez û reftaran bibin. Her têkiliyeke we bi zarokê/a we re şêweyekî danûstendinê ye. Ne tenê bi gotinên ku hûn dibêjin ve girêdayî ye: dengê we, têkiliya çavên we, hembêz û maçên we - ev hemî peyamên ku hûn ji zarokê/a xwe re dişînin in. Awayê ku hûn bi zarokê/a xwe re danûstandinê dikin ne tenê fêrî wan dike ka merov çawa bi yên din re têkilî datîne, lê di heman demê de pêşveçûna wan a hestyarî û çawa ew di jiyana xwe ya paşîn de bi yên din re têkiliyan ava dikin jî şekil dide.”

# Diyardeya parsektiyê li Sûriyê

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Di encama dirêjbûna kirîza Sûriyê diyardeya parstektiyê gihişt asteke bilind. Li Sûriyê di dema heyî de hejmareke zêde ya zarok, jin, mêr, kal û pîran li kolan û bazaran belav dibin û rojane parsê dikin. Ev diyarde wêneyekî êşa kûr û dijwar a mirovan nîşan dide, li hemberî wê jî çareseriyeke bi lez tê xwestin.**

Li kolan û bazarên Sûriyeyê û li ber deriyên mizgeft û navendên xizmetguzariyê, dîtina kesên parsê dikin bûye dîmenekî rojane. Ev kes ji di nava otombîlan, li ser riyan û li her cihekî destê xwe dirêj dikin û daxwaza alîkariyê dikin. Ev diyarde êdî bi tenê bi komên taybetî yên wekî kal û pîr an kesên astengdar e re sînordar nîne, herwiha zarok, jin û ciwan jî di nav de ne. Piştî zêdetirî 14 salan ji şer parsektî bûye yek ji rûyên krîza mirovî.

**Sedem û şaxên vê diyardeyê**

Belavbûna diyardeya parsektiyê bêyî li ber çavan girtina rewşên awarte yên ku Sûriyê di salên borî de jiyan kiriye, nayê fêmkirin. Ji ber şerê demdirêj bi milyonan kes neçar mane mal û warên xwe biterikînin û bêmal bimînin. Gelek ji wan neçar man ku derkevin kolanan wekî yekane rêya dabînkirina asta herî kêm a jiyanê.
Her wiha, krîza aborî di zêdebûna vê diyardeyê de roleke diyarker lîst, hilweşîna diravî û bilindbûna buhayê kelûpelên bingehîn bûye sedema berfirehbûna xeta hejariyê û niha ji sedî 80 zêdetir ji Sûriyan di bin xeta hejariyê de ne. Li gorî texmînên Neteweyên Yekbûyî, ji ber nebûna derfetên kar û rêjeya bêkariyê ya bilind, nemaze di nav ciwanan de, gelek kes nikarin debara xwe ya rojane peyda bikin.
Hilweşîna malbatê û windakirina debara malbatê ji ber mirin, girtin, an jî koçberkirinê jî bûye sedema ku zarok û jin ber bi parsekiyê ve biçin. Raporên saziyên mafên mirovan piştrast dikin ku hin çeteyên rêxistinkirî ji vê rastiyê sûd wergirtine. Wan dest bi karayîna zarok û jinan di nav torên ku daxwazkariyê wekî “pîşeyek” dihesibandin de kir, ku ev yek pirsgirêk hîn aloztir kir.

**Pîvanên civakî û psîkolojîk**

Bandora parsektiyê ne tenê bi aliyê aborî ve sînordar e, lê di heman demê de bandora wê li ser tevna civakî û derûnî jî berdewam dike. Zêdebûna kesên parsektiyê dikin li kolanan wêneyekî trajîdîk ê civakeke lawaz a Sûriyeyê nîşan dide. Zarokên ku neçar dimînin parsektiyê bikin ji mafê xwe yê perwerdeyê bêpar in û bi xetereya tevlîbûna reftarên nebaş an jî ketina qurbanê îstismara laşî û hestyarî re rû bi rû ne.
Ji bo jinên ku parsê dikin, gelek ji wan ku hevjînîn wan mirine,, hin ji wan di bin zexta torên îstîsmarê de dixebitin. Ev diyarde cureyek normalîzasyona civakî afirandiye, rêwiyên ku di rê de



ne an hevxemiya xwe bi wan re nîşan didin û pereyan pêşkêşî wan dikin, an jî bi guman bi wan re tevdigerin û wan wekî rêyek ji bo qezenckirina hêsan dibînin

**Ev diyarde çiqas mezin e?**

Li gorî destgehên ragihandinê yên nêzî desthilata Şamê, li herêmên di bin kontrola wan de, hijmara kesên parsektiyê dikin nêzî 250 hezarî ne. Ji wan ji sedî 10 zarokin, ji sedî 51 jin in û ji sedî 39 mêrin.

**Çareserî**

Pisporên civakî tekez dikin ku ev diyarde hewceyî çareseriyeke lezgîn e ji ber ku her diçe jimar mezitir dibe. Li gorî pisporên civakî riyên çareseriyê wiha ne:
-Xurtkirina bernameyên piştgiriya civakî yên ku malbatên herî xizan hedef digirin.
-Pêşkêşkirina derfetên kar ên biçûk da ku kesan dihêlin li şûna jiyana li kolanan, bibin xwedî xweserî.
-Ji nû ve entegrekirina zarokên ku parsê dikin di dibistanan de bi rêya bernameyên perwerdehiyê yên taybet.
-Çalakkirina rola qanûnê ji bo hesabpirsîna torên ku xizanan îstismar dikin û parsektiyê dikin karsaziyek qezenckar.
Diyardeya parsektiyê li Sûriyeyê hîn jî şahidiyek zindî ye ji bo asta êşên mirovî û aborî yên ku gelê Sûriyeyê dijî. Di navbera xizaniyeke zêde, windakirina debara jiyanê û îstismara çeteyan de, bi hezaran zarok, jin û mêr rojane vediguherin dîmenekî ku êşa bêdeng nîşan dide. Çiqasî jî înîsiyatîf cûrbecûr bin jî, jiholêrakirina vê diyardeyê tenê bi çareserkirina sedemên bingehîn dê pêk were: Xizanî, bêkarî, nebûna ewlehiyê û hilweşîna xizmetguzariyên bingehîn.



## Desthilatên munafiq

Hafiz Ahmet Turhalli

Mûnafiq gotineke Erebiye û gelekî caran di Qur’ana pîrozde hatîye vegotin. Li ser kesayeta mirov, weke taybetmendiyekê bingehîn tê şîrove kirin. Bi vî navî suretekî heye di Qur’anêde.
Mûnafiq, di Ferhengê de: Mişkê zêviyê, kesê kesayeta xweya rastî vedişêre û xwe bi şiklekî dinê nîşan dide. Ev gotin, ji bingeha masdara “nîfaqê” hatiye çêkirin. Weke sîfat taybetmendiyê ku gotina “Munafiq” hatiye bikar anîn. Ji tiştekî bawer nake, lê li gor berjewendiyên xwe tevdigere. Gotina kû Mişkê Zêviyêye, dema mişk tehlukekî dibîne, di bin axêde gelekî kunên cuda vedide. Dema xeteriyê hîs bike ji wê kunê direve kunekî dîtir. Li gor Qur’ana pîroz jî tê wateya kesên dirû û newêrek. (Ragip el-Îsfehanî El Mûfredat md. “nfq”.) Di sureya Beqerêde Xwedê dibêje Mûnafiq weha bersiva mirovan didin: Dema “jiwanre tê gotin tevlîhevîyan û xerakirinan” nekin! ‘Ew dibêjin na em tenê yê avakirin û çêkirinêne”. Baldarbin! Ew kesên herî pêş yê xerakirin û tevlîhevkirinêne; lê ew jî tê nagihêjin. (Beqere 11-12) Dema mirov van ayetan dixwîne; dibîne ku taybetmendiyên mirovî sîfetên mirovî, dîrok û amûr biguherinjî, ew naguherin.
Ji xwe Qur’an a pîroz mirovahîyê dike sê beş: Kesên Bawermend ku heqîyê diparêzin, kesên ne Bawermend ku dij rastiyan disekinin û kesên kû çawa jiwanre rast were, xwe weha dizivirînin. Li gor Qur’ana pîroz kesên Munafiq û dirû kesayetên herî xirabin. Ew di tebeqa jêrê ya însanadane, ji wan berjêrtir tu tiştekî din nîne. Em îro bi çavên xwe dibînin û zindî dijîn ku desthilatdar kesayetên ku hezar ruyên wan hene. Ne baweriya wan, ne jî îdeolojiya wan heye.
Hemû tiştan ji bo desthilata xwe berovajî dikin û dikevin hezar rengî de.
Em temaşe dikin ku kesê neha buye serokê dewleta Surî ya veguhêz, qaşo bi navê Îslamê, Şerîetê, dijiyatiya Kapitalîzm, Rusya û Çînê kar kiriye. Lê di rastiyêde xizmetkarê van desthilatan buye. Derdikeve bernameya Televîzyona Emerîka û bi serokê Îstîxbarata berêre û tevlî bernameya TV yê dibe: Dibêje me gelekî karekî baş kir. Gelo serokê Îstîxbarata Emerîka û Colanî bihevre çi kar kirine? Bi navê Îslam û Mûcahîdîyê jiyan li Kurdan û kesên bindest kirin dojeh. Bi milyonan mirovên bê guneh kuştin. Bi sedan bajar xera kirin û dewlet têkbirin.
Gelo ev çi deme em têdene: Bi milyonan Însan bi navê edaleta Îslamê û bidestxistina buhuştê bi pîlan hatin rêxistin kirin. Ji bo eniya Kuffarê bişkînin û edaletê bînin, ji Pêxember û Qur’anê bang dihatin kirin! Kuffar kîbûn; Emerîka, Rusya û desthilatên din. Kesên pêncî sale dijiyatiya sîstema kapîtalîst dikin, rihê berdidin, tesbîh di destan de digerin ew in.
Di dawîyêde jî desthilatdarên cîhanê dibêjin te xizmetekî baş bo me kir. De keremke were para, xerakirin û kuştinên xwe bigre.Lê binêrin, Trump, Macron, Şeyxê Qeterê û Erdogan çawa bihevre dikenin û bihevre danûstandinan dikin. Kes nabêje ev çi rewşe; bes hûn bi me keniyan!
Ev munafiqiya ku eşkere ye, kuştin, malwêranî, talan û tunekirin tenê berjewendiyên desthilatdarane. Em xelkê rojhilata navîn, ol, mezhep û nîjada me çidibe bile bibe, divê em li gor vê heqîqetê destê hev bigrin û ji dek û dolabên van Munafiqan xwe azad bikin. Li hemû Rojhilata naverast, bindest û kesên mafên wan ji wan hatiye girtin, yekîtiya xwe li ser edalet û wekhevîyê çêbikin û ji van munafiqan dûr bikevin.



# Ikram Balekanî: Li Ewropa qirkirina spî heye

Ikram Balekanî bi gotinên Kurdî yên pêşiyan ku kevir li cihê xwe giran e û dar li ser koka xwe şîn dibe tekez kir ku mirov jî li ser axa xwe û bi çanda xwe zindî ne û got, “Bi saya Tevgera Azadiyê, Kurdên li derveyî welat xwe bi rêxistin kirine, sazî û dezgehên wan hene, eger Kurdek xwe dûrî van saziyan û vê civakê bixe, wê di nava çerxa serdest de bihele.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê bandora çand, şerê taybet û derûnî li ser Kurdên ku penaberî Ewropa bûne, Nivîskar û Rojnamevan Ikram Balekanî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**- Kurdên ku penaberî Ewropa bûne di milê çand, ziman û kelepora Kurdî de çi bandor li ser wan bûye û pişaftin di çi astê de li ser wan tê meşandin?**

Li Ewropa qirkirina spî heye. Gotineke kurdî heye dibêjin, “Kevir li ciyê xwe giran e” an jî “Dar li ser koka xwe şîn dibe.” Bi rastî jî wisa ye. Li darekê bifikirin, eger ji kokê rabû êdî ba dikare bide ber xwe û bibe. Mirov jî li ser axa xwe û bi çanda xwe zindî ne. Dema ji welatê xwe rabûn eynî wekî dara ji koka xwe qetiyayî dikevin ber bayê. Pir zehmet e ku mirov bikare li dûrî Kurdistanê çanda xwe biparêz e, eger dûrî civaka xwe be. Ji ber ku li Ewropayê jî êdî civakeke Kurdewarî çêbûye. Bi xêra Tevgera Azadiyê, Kurdên li derveyî welat jî xwe bi rêxistin kirine, sazî û dezgehên wan hene. Eger Kurdek xwe dûrî van saziyan û vê civakê bigire, bêguman wê di nava çerxa serdest de bihele û bêyî ku pê bihise wê zarok jî dest herin û çand nemîne.

**- Li Ewropa li ser gelê Kurd di milê şerê teybet û derûnî de çi siyaset li ser wan tê meşandin û rêbazên ku têne meşandin çi ne?**



Li Ewropayê ji bo Kurdan bi taybetî na, lê ji bo hemû gelên ku bûne penaber hema eynî siyaseta helandinê heye. Di bin navê entegrasyonê de wan dihelînin û asîmîle dikin. Eger bi rastî entegrasyon bûye baş bû, lê ya ew dikin bi demê re dibe asîmilasyon. Ez mînaka malbatekê bidim. Bifikirin ku malbateke ji Kurdistanê diçe Ewropayê, xwe dûrî civaka Kurdewarî digire, naçe saziyan û naçe komeleyên Kurdî. Ew malbat êdî li ber kêra mirinê ya çerxa serdest e. Pergal rasterast dayîk û bav nahelîne, ji ber ku ne mumkin e kesekî mezin wisa zû asîmîle bibe, lê ew li ser zarokan dixebitin. Dêna xwe bidinê zarok 2 û 3 salî diçe hînê, ziman, lîstik, mamoste û çand biyanî dibe. Mezin dibe diçe baxçê zarokan dîsa mamoste, ziman û çand biyanî ye. Dibe 7 salî diçe dibistanê, ziman û çand biyanî ye. Vedigere malê, westiyayî û gêj bûye, divê spartek û dersa ku mamoste daye wan jî çêkin. Li malê jî axaftin eger bi Kurdî hebe, were, here, bixwe, qurbana te bim û gotinên rojane. Lê zarok êdî westiyayî ne, naxwazin biaxivin jî. Gelek ji wan ji ziman dixeyîdin. Ji ber ku derfetên sîstemê zêde ne, TV û radio, pirtûk û lîstik bi zimanê wan pir in û zarok jî her roj bi wî zimanî û wê çandê mezin dibin. Êdî helandin dest pê dike.

Dema zarok dibin 10 û 12 salî, êdî ji dayîk û bavê xwe zêdetir mamosteyan dibînin. Ji seat 7’ê sibê diçin dibistanê heta 4’ê piştî nîvro. Paşê tên kursên taybet dest pê dikin. Yan avjenî, yan sporek din, yan kursek hunerî ku ew jî piranî hunera biyanî ye, êdî zorak westiyayî bi şev tên malê. Heta nan jî li dibistanê dixwin. Êdî dema têne malê çend gotinan bi malbatê re biaxivin yan neaxivin, diçin nav ciyan û radizên. Sibê eynî tişt. Heta malbat pê dihese zarok bûne biyanî û çûne. Bi vî rengî nifşek dihele û nifşa din êdî nizane ku ji Kurdistanê jî hatiye. Bi kurtî bi pembû serê mirov jêdikin. Eger em mînaka civaka Êzidî jî bidin wê çêtir were famkirin. Êzidî bi du awayan dihelin. Hem di hêla çand û ziman de û hem di hêla olî de. Li Ewropayê di destpêkê de texmîn dikin ku civakek vekirî û rihet heye û serbest in, hêdî hêdî ji civakê dûr dikevin, naçin malên êzidiyan û xwe ji civakê dûr dikin. Hestên parastinê kêm û lewaz dibin. Bifikirin eger li Şengalê êrişeke fîzîkî hebe, li wir refleks û helwesta parastinê jî xurt dibe. Tê kuştin, şehîd dibe lê teslîm nabe, nahele. Mixabin li Ewropayê ev refleks dimirine. Qirkirina spî heye.

**- Li hemberî pişaftin û asîmilasyona ku li ser gelê Kurd tê meşandin, rêbazên têkoşînê çi ne û heyanî çi astê gelê Kurd di warê rêxistinî de sîstema parastin û rêxistinkirina xwe ava kiriye?**

Ji bo ku li derveyî Kurdistanê tu nehelî, divê tu ji civaka xwe dûr nekevî. Eger em behsa Ewropayê bikin, bêguman em mafê Ewropayê nexwin. Eger tu bi rêxistin bî, tu mafê xwe biparêzî ew li pêşiya te nabin asteng û heta tu dikarî ji derfet û imkanên wan jî sûdê werbigirî. Bo nimûne li Siwêdê bifikirin, bi hemû zaravayên Kurdî dersên zimanê Kurdî didin. Dewlet fînanse dike û derfetê dide zarokên Kurd zimanê xwe jî hîn bibin. Lêkolînan nîşan daye ku zarokên li Siwêdê yên bi Kurdî hîn dibin, di dersên Siwêdî de jî jîrtir in, ev jî girîngiya zimanê dayîkê nîşan dide.
Me mînaka malbatên helandî dabû. Eger eynî malbat, hefteyê rojekê yan du rojan zarokên xwe bibe çalakiyên Kurdan, malên kurdan, komeleyên kurdî, danê ber dersên zimanê Kurdî, kursa muzîka Kurdî, govenda Kurdî, li malê Zarok TV û televîzyonên Kurdî temaşe bikin û li malê zimanê biyanî li wan heram bike, êdî ne mumkin e ku sîstem bikare wan zarokan bihelîne.
Li Ewropayê bi dehan televîzyon, Federasyon, bi sedan komele û saziyên Kurdistanî hene. Her salê li sedan navendan festîvalên govend, çand, huner, konser, şano, fîlim û çalakiyên çandî pêk tên. Eger ji wan dûr nekevin, beşdar bibin wê xwe ji bîr nekin û bizanin ji ku hatine. Yanî parastin bi xwenasînê dest pê dike. Lê çi dibe bila bibe, divê sazî û dezgehên Kurdistanî jî xwe nû bikin, ji bo zarok û ciwanan tiştên balkêş pêşkêş bikin ku bala wan bikişîne û beşdar bibin. Divê Akademiya Kurdî were aktîfkirin, dersên sînema, senaryo, muzîk, govend, şano û kamerayan bê dayîn. Ew dibe derfetek ku zarok werin teşwîqkirin û beşdar bibin. Lê çi dibe bila bibe, welatê xelkê nabe welatê mirov. Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan banga vegerê li Kurdan kiribû, bêguman pir bangek bi wate û li cî ye. Dibêje kesên ku derfetên wan hebin divê vegerin û ji bo welatê xwe bixebitin. Ev bang ne tenê ji bo Bakur e. Bêguman ji bo Şengal, Rojava û ji bo Başûr e jî. Divê yên ku dikarin xizmeta welat bikin û bi vegera xwe wê welatê xwe ava bikin, sedî sed divê vegerin. Pêwîst e sazî û rêxistinên Kurdan jî ji bo vegerê derfetan ava bikin û rêya wan xweş bikin.

**Ikram Balekanî kî ye?**

Ikram Balekanî ji Rojhilatê Kurdistanê ji bajarê Urmiyê ye. Beşa Fîzîk û Matematîkê xwendiye. Endazyariya Kamputerê ya Zanîngeha Zahidanê bi dest xistiye, lê piştî ku hate dûrxistin, derkete derveyî welat û dest bi karê rojnamegeriyê kir. Bi salan e li kêleka rojnamevaniyê karê wergerê jî dike. Li gelek radyo û televîzyonên Kurdî de ked da û xebitî. Li hemû televîzyonên li ser şopa MED TV de xebitî ye. Bi salan edîtorî û nivîskariya rojnameya Azadiya Welat kir. Di serdema duyem a Kovara Mizahî ya Pîne’yê de edîtoriya giştî ya kovarê kir. Ew sernivîskarê kovara Pîne bû. Li “Ajnasa Nûçe ya Dicle”yê jî edîtorî kir. Li Enstîtyoya Kurdî ya Stenbolê wek senator hat hilbijartin. Ji bo amadekirina pirtûka mamê Feqî (Feqî Huseyin Sagniç) a bi navê “Dîroka Wêjaya Kurdî” gelek ked da û alîkarî kir. Serdemekê jî di Kovara mizahî ya “Zring”ê de nivîsî. Çarînên Emer Xelam (Omer Xeyam) wergerandin ser zimanê kurdî û zaravayê kurdmancî. Ew pirtûk sala 2014’an li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneya Evrenselê ve bi navê “Çarînên Omer Xeyam” hate çapkirin. Çapa duyem jî sala 2024’ê bi navê Çarînên Xeyam hate weşandin.
Ikram Balekanî ji bilî karê rojnamegeriyê, filmname, senraryo, gotinên stranan û nivîsên mizahî jî dinivîse. Awaz û ahenga stranan çêdike, stranan dibêje û helbestan jî dixwîne. Yekemîn Romana wî bi navê “13” sireke hezar salî sala 2024’ê bi hemû zaravayên Kurdî hem wext hate weşandin. Ev gaveke yemek bû li Kurdistanê ku pirtûkek bi hemû zaravayan û her zaravayek wekî pirtûkek cuda û serbixwe were çapkirin.



# ‘Heta ku Rêber Apo azad nebe wê tu pirsgirêk çareser nebe’

**Endama Rêveberiya Aboriya Kongra Star a Qamişlo Xaliya Necar diyar kir ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ji bo serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi erkê xwe yên dîrokî rabûn, lê dewleta Tirk heta niha helwesta xwe diyar nekiriye.**

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Derbarê pêşveçûnên pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk û nêzîkatiyên dewleta Tirk ji pêvajoyê re, endama Rêveberiya Aboriya Kongra Star ya Kantona Qamişlo Xaliya Necar bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**Piştî konferansa PKKê û merasîma şewtandina çekan, herwiha tevî hemû bangewaziyên navneteweyî heta niha Rêber Abdullah Ocalan azad nebûye, hûn nêzîkatiyên dewleta Tirk çawa dinirxînin?**

Piştî zêdetirî 50`î salî ji berxwedan û têkoşîna gerîlayên azadiyê, bê gûman banga Rêber Aop ya çekdayînê bi cî anî, lê ne hat wê wateya ku gerîla nema û têkoşîn bê encam bû, berovajî wê. Ev gaveke dîrokî bû ku armanca jê ew êdî ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê bi taybetî li Bakurê Kurdistanê di rêya danûstandina de were çareserkirin. Bi taybetî bi dewleta Tirk re, lê heta niha delewta Tirk ji bo çareserkirina pirsgirêkan tu gavên pratîkî nevêtiye. Ya girîngtir jî ew e ku heta niha Rêber Apo fîzîkî azad nebûye û tecrîd jî berdewam e. Divê di qûnexeke wiha hestiyar de, dewleta Tirk jî gavekê bavêje û gava yekê jî azadiya Rêber Apo ye. Lewra heta ku Rêber Apo azad nebe wê pirsgirêka gelê Kurd jî çareser nebe. Çimkî ji bilî Rêber Apo wê tu kes nikaribe vê pêvajoyê birêve bibe. Bê gûman ne tenê dewleta Tirk divê tevahiya cîhan vê yek bizanibin heta ku em Rêber Apo di nav xwe de azad nebînin heta hemû girtiyên di zindanên dewleta tirk azad nebin, wê ti pirsgirêk çareser nebe. Ji bo ber bi jiyaneke azad û aşîtiyane Rêber Apo banga şewtandina çekan kir, helbet Tevgera Azadiyê jî azadiya Rêber Apo di pêkanîna vê gave de dît. Lê bêdengiya dewleta Tirk nediyarkirina helwesteke wê zelal ji bo birêvebirina vê pêvajoyê, dihêle pirsgirêka gelê Kurd û alozî kurtir bibe.

**Kar û xebata gel her wiha kongreyê ji bo azadiya Abdullah Ocalan çi peyamê nîşan dide?**

Ji xwe armanca sereke ya xebatên ji bo azadiya Rêber Apo diyare, gel ji cîhanê teva re dide nîşandan ku wê ti carî gelê Kurd herwiha gelê azadîxwaz wê nikare xwe azad bibîne heta ku Rêbertiyê azad nebînin. Lewra azadiya Rêber Apo misogeriya mafê gelê bindest e. Ti kes nikare vê yekê



înkar bike ku, ji bilî pirojeya rêveberiyê gel bi çanda xwe jiyan bike. Lewra ev felsefeyek ku mafê hemû gelan tê de tê parastin. Ji bo wê êdî gelê herêmê gihiştiye wê bawerê ku heta Rêber Apo azad nebe gel azad nabe.

**Tecrîda berdewam çawa bandorê li moralê tevgera Kurd û bi taybetî jinên Kurdistanê dike?**

Ji ber ku ti tevger ti dewleta ti netew mafê jinan ne parastiye mîna ku Rêber Apo parastiye, helbeta berdewamiya tecrîdê bandorê li ser me jinan heye. Lê ev nayê wê wateyê ku em qels bibin, berovejî wê ji bo parastina mafê xwe û têkoşîna ji bo azadiya jinan, em hîn bêtir kar û xebatên xwe pêşdixînin. Li seranserê cîhanê bi taybetî li her çar perçeyên Kurdistanê, ne tenê jinên Kurd niha banga hemû jinên azadîxwaz ew e ku, bi Rêbertiyê re hevdîtinê pêk bîne. Lewra em azadiya xwe parastina mafê xwe yê jiyanê di ramanên Abdullah Ocalan de dibînin. Ji bo wê heta ku em Rêbertiya xwe azad nebînin emê di nava liv û devgerê de bin.

**Di vê qûnaxê de ji civaka navneteweyî û rêxistinên parastina mafên mirovan çi tê xwestin da ku piştgirîya doza Abdullah Ocalan bikin?**

Bi sala em bang li dewletên navdewletî û rêxistinên parastina mafê mirovan dikin ku, di her civîneke de di her kongreyekê de di her çalakiyeke mirovî de, destê xwe deyîne ser wijdanê xwe û ji bo azadiya Rêbertiyê erkê xwe yê mirovî pêk bîne. Herwiha bi hezara mirovê me li dewletên xwedî rol dijîn, ew jî di rêya lidarxistina çalakiyên cûda, dikarin bibin dengê gelê xwe. Mîna silogana me ya `Bê Serok jiyan nabe` wê her tim banga me jî ji cîhanê ev be ku bê Rêbertiyê jiyane ji me re jî tune ye. Lewra yê ku wê aşîtiyê li Rojhilata Navî tevê bîne keseyet û felsefeya Rêber Apo ye.

# Li ‘hêviya Ewropaya delal’ (!)

**Volqan Elî**

Di hefteya seyemîn a meha Îlonê de tiştekî balkêş çêbû! Ya rast ew e, yên heqîqeta Ewropayê dizanin, ev rewş pir bi balkêşî pêşwazî nekirin. Bûyer çi ye?

Tê zanîn. Saziyên rayedar ên eleqadar ên Yekîtiya Ewropayê, derbarê Rêber Apo de qaşo biryara ‘hêviyê’ ku tê zanîn, dubarekirin yan jî taloqkirin. Ji derveyê hûrguliyan, ev dibêje “nabe ku dewleteke bi Yekîtiya Ewropayê re bi şiklekî eleqadar, di nava sînorên xwe de cezayê hetahetayî bide dîlgirtiyên di bin destê xwe de. Divê ev ceza bi 25 salan sînordar be, her dîlgirtî xwediyê wê hêviyê be ku piştî vê demê azad bibe.” Jixwe ev qanûneke darêzê yê Yekîtiya Ewrûpayê ye û di heman demê de Tirkiye jî ne endamê vê saziyê ye. Lê Tirkiye bi YE’ê re peyman daniye ku ew jî girêdayî vê biryarê bibin.

Vaye mijara me jî ev e; YE’ê vê biryara li ser Rêber Apo ne ku nû distîne; heta tê gotin ji 2014’an ve biryareke wê ya wisa heye. Cara yekemîn jî, par bi temamî kiribû rojevê û îsal jî, wekî xwe rezîl bike, ev dubare kir. Wekî me di destpêkê de gotibû, ji bo kes û derdorên hişmendiya dagirker a Ewropa û modernîteya kapîtalîst hinekê nas dikin, bi vê qaşo biryarê zêde neman şaş. Her çendî wisa be jî, li meydanê balkêşiyek heye. Çi ye? Ewrûpa bi vê biryara xwe ya ne ya xêrê wekî ku bixwaze ji Tirkiyê re bêje: “Abdullah Ocalan di rastiyê de dîlgirtiyê min e. Tu tenê gardiyanekî! Xet û sînorê xwe bizane. Di vê mijarê de kêm yan jî zêde her biryarê ez didim. Ma ne min, dema Abdullah Ocala hatibû Ewropa nehiştibû nefes jî bistîne! Min, ew dehf dabû xefika Gladio! Ya din jî, di derbarê vî kesî de bêyî min ti tiştê erênî û neyînî nefikire, ya hê rastir ti tiştî nefikire. Jixwe tu gardiyanekî; heqê te tenê ew e ku tu mifteya zindana İmraliyê di destê xwe de bigirî: ewqas... Dema ez bixwazim ez ê behsa ‘heqê heviyê’ bikim. Eger nexwazim, ez ê çi bikim kêfa min dizane!”

Jixwe ti kes neketiye mejiyê Yekîtiya Ewropa û desteya wê ya wezîran! Wê demê yekê bêje tu çi dizanî Ewropa wisa difikire. Heqê wî/wê heye! Bi rastî mirov nikare tam bizane çi dekûdolab dizivirînin. Çi difiroşe Tirkiye û çi jê dikire! Ji ber ku vê modernîteya kapîtalîst a Ewropayê ji ava çiyayên Olîmposê vexwariye. Xwedayê vî çiyayê neletî Zeus, ji ber ku ji hevsera xwe diheside, wê dadqurtîne. Hevsera wî li Athenaya keça wî ducanî bûye. Lê tesadufî ew zarok-xwedawenda namire. Zeus wê ji eniya xwe diwelidîne. Li gorî çîrokê, Zeus wekî xwedayî neheqî û bêexlaqiyê tê naskirin. Ev ne hema belasebeb e; keçeke wî ya bi navê Persepones a pir xweşik û bedew hebûye. Çima ku pê re (Zeus) damara namûs û fezîletê nebûye, destdirêjî li vê keça xwe ya Xwedavend dike; jê re du zarok çêdibin!


Zeus ku xwedayê zilm û xurufînê ( ji aliyê cinsî ve) bûye, dema welat bi welat di vê oxirê de ji xwe re digere, rastî Xwedavendeke bi navê ‘Ewropa’ (ev Ewropaya me ya îro jî navê xwe ji vê distîne) tê. Bi hezar dekûdolaban wê dixapîne û direvîne çiyayê Olîmpus (çiyayekî mîtolojîk ê Yewnana Entîk). Destirêjî lê dike û di encamê de dibe xwediyê çendîn zarokan. Êdî modernîteya Ewropaya îro ku nêvîçirçirkên Zeûs e, hûn jê re navekî guncaw peyda bikin.

Dibe ku rastiya Ewropayê (modernîteya kapîtalîst) zêdetirê xwe bi çanda Zeusê zalim re eleqadar be. Heta li pêşberê Ewropa, Zeûsê xwedayê xwedayên çiyayê Olîmpusê yê xwediyê namûs (!), wekî ku bi heft avên Zemzemê hatiye şuştin paqij e! Na! Ev gotin qe jî ne neheqiyek e! Çima û çawa? Em ti tiştî li ser zêde nakin, ji derveyê vê mijarê, em li çarenûsa gelên Îranî binêrin.

Ber bi salên 1980’yî ye. Dema li welatê Îranê şoreşa demokratîk pêl bi pêl bilind bû, jixwe ji ber ku berjewendiya Ewropa di Şahê Îranê de nema, yan xwest ku tevgera gelên Îranî, ji xwe re bike berjewendî, destek da tevgera paşverû ya Xumeynî, ew bir li ser çongên xwe, li Ewrûpa hêjand û mêjand û berda canê gelên Îranê. Îro di vê sedsalê de niha bi saya vê desteka Ewrûpa, welatê sekafetê ya hezar salan Îran bû bihuşta paşverûtiyê. Niha jî dikin û nakin, nikarin vê rejîma ceberût hilweşînin.

Dîsa peykerê bêwijdaniyê, rejîma Sedam, tê zanîn ku çekên xwe yên kîmyawî di serî de ji Almanya û dewletên din ên Ewrûpayê peyda kiribû ku karîbû, zêdetirî pênc hezar Kurdî li Helebcê qetl bike! Heman Sedam bi vê (qaşo) sedemê hate îdam kirin. Dema ku me got, vê Ewropayê ji ava çiyayê Olîmpusê vexwariye, vaye maneya wê ew bû! Bi rastî jî dema ku em behsa bênamusî, dekûdolab û fenûfûtên xwedayê zalim Zeus dikin jî em hema ji ber xwe nabêjin. Ma mîtolojiya Yewnan a Entîk me çêkiriye! Na! Dîroka wan bi xwe ye. Hem jî niha kirine bi hezaran pirtûk, ew bi xwe jî em jî dixwînin!

Niha jî em bi rastî bifikirin: Zeusê xwedayê zalimî û neheqiyê, eger rojekê di xewna xwe de nêvîçirçirka xwe ya Ewrûpaya niha dîtibûya, her hal dê bigota “ tu ne ji min î, ma ez ewqas fêlbaz û durû bûm.”



## Rêya me rêxistin û berxwedan e!

**Sînan Cûdî**

Gelê Kurd û Şoreşa Rojava di serdemeke dîrokî re derbas dibin. Ger em vê serdemê rast şîrove nekin, dibe ku sibê bi encamên pir girantir re rû bi rû bimînin.

Vexwendina Ehmed El-Şara bo 80emîn Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ne tenê jestek dîplomatîk e. Ev yek nîşan dide ku Sûriyê ya bi koka cîhadîst, navendî û dijî gelan di asta navneteweyî de hatiye naskirin. Xeta cîhadî ya ku berê mirov dişewitand û qetil dikir, îro di bin maskeya “serokê dewletê” de vediguhere aktorek rewa, ev jî kiryareke nû ya lîstikên bi xwîna gelê me ye.

Ev pêşketin ji me re wiha dibêje: Sûriyeya Nû ne ji bo îradeya azad a gel, lê ji bo desthilatdariyeke navendî ya olî-îdeolojîk tê radestkirin. Ev yek, di encamê de, ezmûna azadiya jinan, demokrasiyê û civakek ekolojîk a li Rojava hedef digire.

Divê ketina Erdogan bo Qesra Spî piştî şeş salan û hevdîtina wî bi Trump re jî li vê wêneyê were zêdekirin. Ev ne hevdîtineke dîplomatîk a asayî ye. Ev hevdîtin nîşana ji nû ve girêdana Tirkiyeyê bi eksena DYA-Îsraîlê re ye. Bi peymanên çekan, sozên aborî û danûstandinên herêmî, Tirkiye tê kişandin nav stratejiyeke zextê ya nû ku Sûriye û Kurdan hedef digire.

Em ji bîr nekin: Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku ji hêla Rêber Apo ve di 27ê Sibatê de hate ragihandin, rêya azadî û jiyana hevbeş ji bo Kurdan û hemû gelan destnîşan kir. Lê belê, dewletan vê pêvajoyê sabote dikin û hewl didin ku îradeya gel bitepisînin. Nêzîkbûna di navbera DYA û Tirkiyeyê de divê wekî hewldanek ji bo sekinandin, an jî têkbirina vê pêvajoya aştiyê jî were şîrove kirin.

Hem naskirina Ehmed El-Şara li NY û hem jî hevdîtina Erdogan-Trump nîşan didin ku stratejiyeke yekane heye:

1. Daxwazên Kurdan ji bo xwerêveberiya demokratîk dê werin redkirin.
2. Têgihîştina yekgirtî û navendî ya dewletê dê were xurtkirin.
3. Hewldan dê werin dayîn ku destkeftiyên demokratîk ên gel werin tasfiyekirin.

Bi kurtasî, Kurd careke din di lîstikên berjewendiyan ên navbera dewletan de dibin hedef.

Em Kurd di seranserê dîrokê de bi bêhejmar xiyanet, komplo û komkujiyan re rû bi rû mane. Lê her carê, em bi çanda xwe ya berxwedanê dîsa rabûn ser piyan. Ji Mehabadê heta Helebçeyê, ji Zîlanê heta Kobanî, ezmûnên me rastiyek fêrî me kirine: Em ê tenê bi hêza xwe ya rêxistinkirî ve girêdayî bimînin.

Rewş îro jî ne cuda ye. Li ser maseya danûstandinê ya dewletan, zincîrên nû ji bo gelê me têne amadekirin. Tiştê ku dê van zincîran bişkîne hêza rêxistinkirî ya gel û îradeya berxwedanê ye.

Ji ber vê yekê, divê em çi bikin? Divê hemû Kurdên li Rojava, Başûr, Rojhilat, Bakur û dîasporayê bi yek dengî biaxivin. Yekîtiya neteweyî êdî ne luks e; ew meseleya man û nemanê ye.

Divê em rêveberiyên xwe yên herêmî, saziyên jinan û rêxistinên ciwanan bêtir xurt bikin. Her ku beşdariya giştî zêde dibe, rewatiya me jî zêde dibe. Di her fersendê de, divê em destkeftiyên şoreşê ku me li ser bingeha azadiya jinan, demokrasî û ekolojiyê bi dest xistine xuyanîtir bikin. Divê em dostên gel li kêleka xwe bicivînin û dijminên wan eşkere bikin.

Ya herî girîng, divê em ji bo her pêşketinek amade bin. Dema ku em dîplomasiyê dikin, divê em mekanîzmayên parastina civakî yên bihêz jî biparêzin. Ji ber ku dîrokê nîşanî me daye: Gelên neamade di lîstika dewletan de windakerên herî hêsan in.

Geşedanên îro careke din nîşan didin ku heke em çarenûsa xwe bi destên yên din bigerin, em ê winda bikin. Rêya me rêxistin û berxwedan e. Evîna gelê me ji bo azadiyê, pêşengiya jinan, wêrekiya ciwanan û fedakariya şehîdên me rêberiya me dikin.

Werin em yek bin, amade bin û bi çanda xwe ya berxwedanê pêşeroja xwe biparêzin!



# Maseya Colanî û Washingtonê ye an Maseya Kaosê ya ku ji hêla Erdogan ve hatî afirandin e?

**Erdogan ALTAN**

Ma DYA danûstandinan dike? Na. Ew hewl didin ku valahiya ku ji hêla Enqerê ve hatî afirandin tijî bikin. Ji ber yê ku herî zêde wêranî, herî zêde parçekirin û herî zêde xwînrijandin li herêmê çêkir û hêj jî dike dewleta Tirk û desthiladariya AKP’ê ye.

Gotûbêjên qaşo yên di navbera rayedarên Amerîkî û serokê “Hikûmeta Demkî” ya Şamê Colanî (Ehmed Şera), di rastiyê de ne planeke stratejîk a nû ye, ew maseya mudaxeleya awarte ji bo karesata heyî ye. Û navê vê karesatê: siyaseta Tirkiyeyê ya li Sûriyê ye.

Dagirkirina ji sala 2017’an de Cerablus-Ezaz û 2018’an de Efrin, 2019’an de Serêkaniyê û Girê Spî, operasyonên ku heta sînorê Iraqê dirêj dibin di sala 2020’an de… Her carê, jê re digotin “têkoşîna li dijî terorê”. Lê encam çi bû?

Bi hezaran sivîl hatin kuştin, îşkencekirin û êş kişandin.

Bi sed hezaran hatin koçberkirin.

Taxên Kurd, Ereb û Asûrî “hatin Tirkîkirin”.

Li ser navê dewleta Tirk, bi dehan komên çete hatin avakirin.

Aborî hilweşiyaye, çandinî îflas kiriye, petrol hatiye dizîn.

Û niha… DYA tê û dibêje “îstîqrar”. Ji ber ku kes nemaye!

**Colanî kî ye? Berhema Valahiya ku ji hêla Tirkiyeyê ve hatiye afirandin**

Hêsan e ku meriv Colanî (Ehmed Şera) wekî “kuklayek” bi nav bike. Lê neyê jibîrkirin ev kes û pêkateya wî ji aliyê hêzên hegemon û dewleta Tirk ve bi pesindanan tê pivdan. Ji ber ku Enqerê xwe wekî yekane alternatîf li herêmê pêşkêş kir û ew “alternatîf” dagirkirin, talankirin, koçberkirin û endezyariya demografîk bû.

Ma Colanî kesayetek bi hilbijartinê bûye qaşo Serokomar? Na.

Lê gelo fermandarên di “Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê” de (OSO), ku Tirkiye piştgirî dide wê, hatine hilbijartin? Na. Ew ji eniyê hatine tayînkirin, bi cebilxaneyê hatine xwedîkirin û talîmat ji Enqerê wergirtine.

Di vir de rola DYA çi ye? Ji agirê hatiye pêxistin sûd wergirtine an jî hewildana vemirandina xaniyê dişewite ye?

Rast e ku DYA li dû petrolê ye. Ew dixwaze baregehên leşkerî ava bike, ev jî rast e. Lê dema ku vê yekê dike, ew li ser xweliyên bizotên agirê ku Tirkiyeyê li dû xwe hiştiye rûdine.

Werin em bînin bîra xwe:

Di sala 2019‘an de, Serokê AKP‘ê Erdogan telefonî Trump kir û got, “Ji Sûriyê vekişin-qet nebe xwe ji heremên navbêra Kobanê heya Qamişlo vekişin” - û DYA vekişiya. Encam? Êrişên dagiriyê yê bi navê „Kaniya Aştiyê“ ya li ser Girê Spî û Serêkaniyê dest pê kir, bi hezaran kes koçber bûn, girtiyên DAIŞê reviyan, jin rastî tecawizê hatin û zarok mirin.

Niha, heke DYA bizivire û bêje, “Werin em aramiyê ava bikin,” ew gaveke ji zihniyeta emperyalîst zêdetir, bertekeke panîk e li hember agirê ku nayê vemirandin e.

Û erê! Destên DYA jî ne paqij in. Lê destên herî qirêj ên Tirkiyeyê ne ku heşt sal in li herêmê şerekî giştî dimeşîne, topan li bajaran dibarîne, mirovan sirgûn dike û ji kuştina zarokan ti fikar nake.

Kî li ser Maseyê nîne? Dengên ku ji hêla Tirkiyeyê ve têne tepeserkirin

Partiyên Kurdî: Ji bilî hin kesên ji nava ENKS’ê nehatine vexwendin - ji ber ku Enqerê wan wekî “terorîst” îlan kiriye.

Eşîrên Ereb: Ji bilî çend komên ku di bin navê hêzên eşîran ên ji aliyê MÎT û HTŞ’ê ve hatine biçek kirin, kes nîne. Bi taybetî yên li Dêra-Zor û Reqqayê, ew ji Esed, Tirkiyeyê û “Hikûmeta Demkî” bi gazincin. Lê dengê wan tê tepisandin.

Civakên Asûrî û Ermenî: Ev kom ku di dîrokê de bindest bûne, hîn jî di bin navê “îstîqrarê” de têne qurbanîkirin.

Rêxistinên jinan: Berxwedana herî xurt li vir çêbûye - lê ew li ser maseya biryardanê nînin. Ji ber ku ne Enqere, ne Washington, ne jî şêwirmendên Colani îradeya jinan napejirînin.

**Karesata Hiqûqî: Dagirkirina Tirkiyeyê Qet Nayê Gotûbêjkirin!**

Li gorî qanûna navneteweyî:

Hebûna leşkerî ya Amerîkayê nakokî ye. Lêbelê, dagirkirina Tirkiyeyê bi tevahî neqanûnî ye.

Neteweyên Yekbûyî çi dibêje? “Ji deverên dagirkirî vekişin.”

Parlamentoya Ewropayê çi dibêje? “Hebûna leşkerên Tirk li Sûriyeyê li dijî qanûna navneteweyî ye.”

Rêxistina Çavdêriya Mafê Mirovan çi dibêje? “Komên ku ji hêla Tirkiyeyê ve têne piştgirî kirin bi awayekî sîstematîk talan dikin, tecawiz dikin û dikujin.” Ji ber vê yekê Tirkiye çi dibêje? “Em li wir ewlehiyê ava dikin.”

Ewlehî? Çi cure ewlehiyê? Ewlekariya kê?

Sivîl—an penaberên ku ji bo AKP‘ê bûne bankek dengan?



**Dîrok Dubare Nabe—Ji ber ku Tirkiye hîn jî heman siyasetê dimeşîne**

Kerkûk li Iraqê…Trablûs li Lîbyayê…Niha Heseke, Kobanî, Reqa li Sûriyeyê…

Li her derê heman senaryo heye:

Pêşî, ew dibêjin, “Em ji bo aramiyê dikevin hundir.”

Piştre, “korîdorek ewlehiyê ya daîmî” tê avakirin.

Piştre, nifusa herêmî tê sirgûnkirin, û nifûsên dilsoz ên van hêzên dagirker li şûna wan têne bicihkirin.

Di dawiyê de, ew dibêjin, “Em bi domdarî li vir in.”

Û piştre welatên rojavayî tên û li “peymanek aramiyê” digerin. Ji ber ku vebijarkek din tune. Ji ber ku Tirkiyeyê yekane alternatîf li herêmê afirandiye; û ew alternatîf wêrankirin e.

**Gelên Sûriyê Çi Dixwazin? Sûcdar Zelal e - Divê Hesab Bê Pirsîn!**

Ev pêvajoya dîplomatîk a veşartî, di rastiyê de, mîna îtîrafekê ye: Rêya derketina ji kaosê ku Tirkiyeyê afirandiye, danûstandina bi DYA re ye an na hêjayê nîqaşê ye. Lê wek e civak û pêkate û ol bawerî yên li Sûriyê, wekî mirovên xwedî wijdan, van tiştan dixwazin:

-Ne metna hevdîtinan - lê divê bidawîanîna tavilê ya hebûna leşkerî ya Tirkiyeyê li Sûriyeyê were eşkerekirin.

-Divê Efrîn, Tel Ebyad (Girê Spî) û Serêkaniyê yên dagirkirî tavilê werin valakirin.

-Divê hemî malbatên koçber vegerin - û divê milîsên ku ji hêla Tirkiyeyê ve têne piştgirî kirin werin darizandin.

-Divê talankirin û qaçaxçîtiya çavkaniyên petrol, genim û avê were rawestandin - divê ew di bin kontrola NY de werin danîn.

-Divê welatên ku çekan difiroşin Tirkiyeyê (Almanya, Spanya, Îtalya) werin ambargokirin.

-Divê gelê Sûriyeyê pêşeroja xwe ne di siya topxaneya Tirkiyeyê de - lê bi îradeya xwe ya azad diyar bike.

Peyva Dawî: Aştiya Rastîn Bi Enqerê Nayê

Dibe ku nivîsgehên-ofîsên Washingtonê sar bin - lê odeyên şer ên Enqerê germ in, bi xwînê şil bûne.

Dibe ku generalên Amerîkî li gor berjewendiyên xwe hesaban bikin - lê şêwirmendên Erdogan jiyana mirovan wekî “mesrefa îstîqrarê” dibînin.

Heke hûn aştiyê dixwazin, divê Tirkiye pêşî ji Sûriyeyê derkeve.

Heke hûn azadiyê dixwazin, divê pêşî dagirkerî bi dawî bibe.

Heke hûn demokrasiyê dixwazin, divê pêşî çeteyên di bin navê milîsan de bên hilweşandin-tasfiyekirin.

Maseya di navbera Colanî û Amerîkayê de ne maseyeke aştiyê ye - ew maseyeke ji bo bersivdayîna awarte ye li hember xirbeyên ku Tirkiyeyê afirandîye.

Û ji bîr mekin:

Gelê Sûriyeyê dê pêşeroja xwe bi xwe binivîse - ne bi destûra Washingtonê û ne jî bi zexta Enqerê.

Ji ber ku azadî ne li cihê ku tank lê derbas dibin çêdibe -

lê li kolanên ku jin lê bi dirûşmeya “Jin Jiyan Azadî“ rêxistin dibin,

li taxên ku zarok bi ewlehî diçin dibistanê,

li zeviyên ku karker ji axa xwe debara xwe dikin.

FENER



## Sûriyê di navbera peymana Adarê û bêhêziya Şamê de ber bi ku ve diçe?

**Idrîs Henan**

Bi hilweşîna rejîma Esad û hatina serokê HTŞ re welat derbasî qonaxeke nû dibe ku diviyabû veguhêz û zêde aram bûya. Lê belê rastî û piratîka Şamê, seynala teviliheviyeke nû lêdide ku peymanan paşguh dike û metirsiyên cuda derdixe holê.

Tê zanîn ku 10’ê Adara îsal, peymanek di navbera Fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD Mazlûm Ebdî û serokê hikûmeta veguhêz Al Şera de hate imzekirin. Li gorî wê peymana 8 xalî divê QSD, saziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî serbixwe û demokratîk entegreyî saziyên Şamê bibin. Di heman demê de diviyabû mafên pêkhateyên Sûriyê di destûrê de werin parastin. Ji bona wê jî, heya dawiya sala 2025’an dem hatibû dayîn. Îro jî meh di ser vê peymanê re derbas dibin, lê hîna jî xalên peymanê nehatine realîzekirin. Berovajî, danhevek nîşan û niyetên xirab ên xwebadana Şamê çêbûye ku di yek mewziyê de dizivire.

Tevî ku destpêka Nîsanê li ser herdû taxên Helebê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê lihevkirinek hatiye imzekirin, lê êrişên vê dawiyê yên li ser herdû taxan û Dêr Hafirê, baş nîşan didin ku Şamê piştî hinek welatên cîhanê hewl dan ku sizayên berê li ser Sûriyê sivik bikin, helwesta xwe guheriye ku mirov di derbarê niyetên wê de dixe şik û gumanê. Li gorî dane, liv û tevgerên li ser erdê, Şamê berê xwe daye faktora demê ku heta dawiya salê karibe peymanê dereng bihêle û lê biqulibe. Ev kiryarên han, li cem Kurdan û pêkhateyên dîtir metirsiya ku li derveyî hesabên hikûmeta veguhêz ne ya ku dixwaze demê qezenc bike û desthilata xwe kûrtir bike, zêde kiriye, nemaze piştî ku nûnerên pêkhateyên Sûriyê dûrî her rêkeftinên pêşerojê hatine hiştin.

Beramberî wê jî, Şam bi awayekî amator daxuyaniyên xapînok dide û raya giştî bi gotinên (dê mafê Kurdan di destûrê de were parastin) ditevizîne. Lê deklarasyona destûrî ya ku piştî peymana 10 Adar bi sê rojan hatiye ragihandin, wê gotinê vala derdixîne û ti mafekî Kurdan tê de nîne. Ji xwe ji bona diyalogê, heta niha şandeya Kurdan pêşwazî nake! Ev nakokî û dirûtiya navbera gotin û pratîkê de, gotin û rastiyê de, têgîna nebaweriyê derdixe holê ku metirsiya mezin ew e; ev rejîma bi navê hikûmeta veguhêz, veguhere kopyake heman baweriya yekalî ya rejîma berê. Bê guman nêzîkatiyên bi vî rengî, dê parçebûna heyî kûrtir bike û dê paşeroja Sûriyê ber bi nediyariyê ve bibe.

Ev hikûmeta ku pala xwe daye rewatiya derveyî welat bi rijd e ku senaryoyên bêbextiyê û li dijî berjewendiya Sûriyê û gelên wê siyasetên kirêgir berdewam bike. Lewre jî carek din hewl dide bi sernavê hilbijartinên parlamentoyê tabloyek zexel ê din li kiryarên xwe zêde bike û rewatiya ku ew dibîne raste, tekûztir bike. Bêguman her kes dizane ku tişta HTŞ dike ne siyaset e û temsîla rastiya civaka Sûriyê û gelên wê nake. Li vir jî girîngiya bicihanîna peymana 10 Adarê ji nû ve xwe dide der ku ji bona aştî û aramiya li Sûriyê gaveke bivênevê ye. Rewatî nikare bi biryareke ne rewa re were destgirtin. Êdî hesab li cem HTŞ ye ka wê sindoq û fikrên dernetweyî çiqas xizmetê li pêvajoya xwerewakirina wê bikin? Di encamê de divê Şam zanibe ku kirîz ne di gotin û peymanan de ye, lê belê di vîna siyasî ya wê de ye ku karibe ji hişmendiya hegemon ber bi hişmendiya lihevkirinê ve biçe. Bi gotineke din a zelal, an wê peymana Adarê bi cih bîne, yan jî wê welat bimîne dîlê pevçûn û parçebûnê!